

SİSTEMA PIŞTGIRIYÊ
YA TUNDKARIYA
CINSÎ LI KU YE ?

Tacîz-Tecawiz
**ev ne
sûce
min e!**

Zanyariyêñ ji bo kesên ji ber êrîşa
cinsî-tundkariya cinsî filitîne



www.cinselsiddetlemucadele.org

www.csdestek.org

Amadekar: Ekîba CŞMDyê



Dîzayn: Büşra Erinkurt

İllüstrasyon: Özge Özgüner

Çirîya Paşî 2020

SİSTEMA PIŞTGIRIYÊ
YA TUNDKARIYA
CINSÎ LI KU YE ?

Association for
Struggle against
Sexual Violence



TEVLIHEV, HÊRSOYÎ, XEMGÎN, METIRSÎDAR
HEMÛ JÎ WÊ BIBORIN

Ev broşur behsa tundkariya cinsî ango zayendî
dike; dibe ev zanyarî tiştên tundkariyê bîne bira
te, an jî bandorê li te bike. Heke ku tu di bandora
wê de bimînî bêhna xwe bide û bistîne û hinekî
xwe rehet bikî. Tu dest ji xwendenê berdî û piştî ku
te xwe baş his kir tu dîsa dest bi xwendinê bikî.

Merheba,

Ev broşur, ji bo kesên tundkarî/êrîşa cinsî li wan hatiye kirin û temenê wan 18û ji 18yan berjortir e hatiye nivîsandin. Wê hewl bide rê li ber wan bixe. Wê ji wan re bibêje bê ka divê serî li ku bixin û alîkariyeke çawa bidest bixin. Her weha prosedurên dermankirinê û yasayî jî di vê broşurê de hatine nivîsandin. Ev prosedurên dermankirinê û yasayî li gorî yasayêna sala 2020an ne û dibe di demên pêşiyê de ew yasa bêne guhertin. Yanî dibe kesên tundkarî li wan hatiye kirin bi tiştên cida re rû bi rû bimînin. Dibe nasnameya zayendê û meyla zayendî bibe asteng û nehêle tundkariya li wan hatiye kirin ji hêla hiqûqî ve were naskirin. An jî nehêle alîkariya ku hewce dike were bidestxistin. Wê gavê divê ew bi wan saziyên civaka sivil re bişêwirin ku di van waran de kar dikin. Divê alîkariyê ji wan bixwazin û bihêlin ew berê wan bi cihêن din ve vekin. Heke pêwistiya wan bi zanyariyêna zêdetir hebe, ew dikarin li malpera csdestek.org-ê binêrin.

Têgehên ku di vê broşurê de hatine bikaranîn

Kesên Rizgar Bûne (survivor); Ji bo kesên ku rastî cureyeke tundkariya cinsî hatine tê gotin. Em, weke Komeleya Têkoşîna Li Dijî Tundkariya Cinsî li şûna ‘mexdûr’ gotina ‘kesên rizgar bûne’ tercîh dikin. Lê kîjan gotin bi dilê kê be, dikare wê bikar bîne.

Tundkariya Cinsî: Her cure çalakî, liv û tevger û destwerdanênu ku gefan li zayendîtiyê dixwin di bin navê tundkariya cinsî de têne qebûlkirin. An jî liv û tevger û destwerdanênu ku hewldanê di vê warî de dikin. Bêyî mirov bi awayekî zelal û aşkere destûrê bidin ev çalaki pêk tênu an jî mirov nikarin destûra wan bidin. Ev liv û tevger ne ji ber nihiçkên cinsî yan jî pêdiviyênu cinsî pêk tênu. Armanca van çalakiyan ew e ku dixwazin mirovan biqutifînin, otorîteyê li ser wan ava bikin an jî wan ceza bikin.

Tacîz, Tecawiz, Istismara cinsî û cûreyênu din ên tunkdariya cinsî di Qanûna Cezayan a Tirkan de bi gotinênu tacîza cinsî (tacîz), êrişa cinsî (tacîza ku temas tê de heye, hewldana tecawizkirinê û hwd.), êrişa cinsî ya bibandor (tecawiz) û istismara cinsî ya zarokan (istismara cinsî) tê binavkirin. Ji ber wê ye ku dibe tu li saziya dewletê ya xizmetguzariyê jî van gotinan bibihîzî.

Alîkariya xwe-bixwe (self-help); ‘alîkariya xwe-bixwe’, di wateya ‘piştgiriya xwe-bixwe’ de ye. Kesek dema bixwaze pirsgirêkeke psikolojik û berbiçav çareser bike û ew bi xwe piştgiriya xwe bike, piştgiriyê ji çavkaniyênu xwe û ji îradeya xwe bistîne ji wê re dibêjin alîkariya xwe-bixwe.

Xwe-parastin (self-defans) di wateya ‘parastina xwe-bixwe’ de ye. Kesek dema rastî êrîşeke tundkariyê were û hewce bike xwe bi hêza xwe ya laşî biparêze, ji wê re xwe-parastin tê gotin.

Sistema piştevaniyê: “Tevn a ku ji pisporan û xizman pêk tê. Tevn piştgiriya kesên ji tundkariya cinsî rizgar bûne dike.” Kesên di vê tevnê de cih digirin dibe ku pispor bin an jî ne pispor bin. Heval an jî hevalên te yên ku baweriya te bi wan tê, malbata te, psikolog an jî psîkiyatristê/a te, kesên ku tu û ew xwediyê heman baweriyê ne an jî xwediyê heman helwestê ne dibe di nava vê tevnê de cih bigirin. Ji bilî sistema piştgevaniyê ya şexsî, em, dikarin tevna piştevaniyê ya saziyên sivil û saziyên dewletê yên di nava koordîneyê de bi hev re kar dikin, weke “sistema piştevaniyê ya sazûmanî” binav bikin. Tê bixwe biryarê bidî ku wê kî di nava vê sistema piştevaniya te de cih bigirin, lewre ji te baştir ti kes nizane wê çi cure piştevanî alîkariya te bike.

Plana Ewlehiyê: (Safety Plan): Ji bo wê plana rewşa lezgîn a taybet tê gotin ku tu li gorî şert û mercên xwe, rîskên dibe derkevin pêşberî te dinirxînî û saz dikî. Dibe ne tenê planek çend plan bên amadekirin. Heke tundkarî li te hatibe kirin, heke tu difikirî ku di nav xetereyê de ye, tu dikarî planekê amade bike û dema hewce bike pêk bîne. Dema tu rastî tundkariyê hat an jî rewşeyeke awarte derket holê û di vê rewşê de tu nizanî çi bikî wê gavê ev plana ku te amade kiriye wê bihêle bê tê çawa tevbigerî. Di encamê te tê bikaribe xwe bi hêsanî biparêze.

“Tundkariya cinsî li min hate kirin...”

Tundkariya cinsî yan jî êrîşa cinsî ne
ew cure tundkariye ku ‘hin mirov, ji ber
hin sebeban li wan bê kirin’. Dibe ku
li her mirovî bê kirin. Nabe ev tişt bi
taybetmendiyêن kesa rastî tundkariyê
hatiye, bi liv û tevgerên wê bê nirxandin.

Dibe kesa tundkariya cinsî yan jî erîşa
cinsî lê hatibe kirin xizmeke te be yan jî
nas û dosteke te be ku tu jê hezdikî. An jî
dibe nenaskiriyeke te be.

Tundkarî, dibe ku bi rîya tecawizkirinê,
hewldana tecawizkirinê, tacîza cinsî,
temasên nayêن xwestin an jî liv û
tevgerên cinsî yêن nayêن xwestin pêk
were.

Fail bi xwe biryara tundkariya cinsî dide û pêk tîne. Ev xetaya
fail bi xwe ye; sûc e û cezayê vî sûcî heye.

Berteka ku tê di dema êrîşa cinsî de nîşan bide bi çi şêweyî
dibe bila bibe, ew berteka herî rast a te ji bo xwe hilbijartiye
(bêbertekî jî bi heman awayî ye). Hemû biryarên ku tê di
dema tundkariyê de û piştî wê bide, bi ewlehiya te û bi wan
şert û mercen te re têkildar in. Piştî êrîşa cinsî jî divê tu di serî
de li ewlehiya xwe bifikirî. Beriya her tiştî divê tu biçî cihekî
ewle ku tu bikaribî xwe li wir biparêze.

Normal e ku hin bandorêن neyêni yêن êrîşa cinsî/tundkariya

Êrîşa cinsî her
bi çi rîyê pêk tê
bila pêk bê, ev ne
xeteya me ye!



cinsî li te bibin. İstismara cinsî û tundkariya cinsî dihêlin ku trawmaya giyanî bi mirovan re çêbibin. Lê divê em ji bîr nekin ku trawma tecrubeyeke şexsî ye; dibe ku trawmaya giyanî bi herkesi re çênebe. Dema hinek kes sînorêñ te yên şexsî derbas dikin, dibe ku tu bixwazî fail werin cezakirin, di encama vê de dibe ku tu xwe baş his bikî û di nava ewlehiyê de bibînî, navekî li bûyerékê deynî û/an jî wê bûyerê ji bîr bikî. Bandora van hest û pêdiviyêñ ku piştî tundkariyê derdikevin holê li her kesî cida cida têñ dîtin.

Alternatîfên me

Tundkarî ne tiştekî wisa ye ku tê çaverêkirin, her weha rewşeke awarte ye. Normal e ku piştî tundkariyê serê te tevlihev bibe û tu nizanibî tê çi bike. Piştî êrişa cinsî tu ne bi tenê yî û tu ne bêçare yî. Tu dikarî bi xwe alîkariya xwe bikî û tu dikarî ji nas û dostan alîkariyê bixwazî. Li gel vê tu dikarî alîkariya tibbî, ya psikolojîk jî daxwaz bikî. Dîsa mafê te heye derbarê tundkariya ku li te hatiye kirin de tu saziyêñ peywendîdar agahdar bikî.

**Di wê demê de ji
bo pêdiviyêñ xwe
tu dikarî gelek
mekanîzmayêñ
piştevaniyê ava bikî
yan jî ji bo avakirina
wan mekanînzayan tu
dikarî bixwazî ku hin
kes piştgiriyê bidin te.**



Piştî tundkariya cinsî ev rê li ber te hene:

Bixwe bawer be: Weke kesa ku ji ber tundkariya cinsî rizgar bûne ye, dibe ku him tu ji bo navekî li tundkariyê bikî û ‘ji bo careke din ew bûyer neqewime’ him jî ji ber baweriyên şaş ên di nava civakê de bicih bûne (kesên rastî tundkariya cinsî bûne ‘wiha diquin, liv û tevgerên wan wiha ne, divê wiha nekin hwd) tu gumanê ji xwe bikî, xwe tohmet bikî û xwe berpirsiyar bibînî. Dibe ku di encama vê de tu tundkariya li xwe hatiye kirin înakar bikî. Heke rewşeke wiha derket holê, divê tu her car bînî bîra xwe ku berpirsiyara wê tundkariyê ne tu yî. Car caran dibe tu piştgiriyê ji nas û dostêñ xwe jî nebînî, lê ev nayê wê maneyê ku bûyera qewimiye ne tundkarî ye yan jî sûcê te ye. Hest, ıfadekirina van hestan û rêbazên têkoşîna bi van hestêñ piştî tundkariyê derdi Kevin holê ji bo herkesî cida cida xwe nişan didin.

**Bertek û liv û
tevgerên te, ne
pîvana wî tiştî
ne ku bawerî
bi te tê anîn an
na. Ya girîng ew
e ku tu bi xwe
baweriyê bi xwe
bînî û tu bi xwe
tiştê qewimiye
weke tundkariyê
penase bikî.**



Ji wan kesan re behsa tundkariyê bikî ku baweriya te bi wan tê: Dibe ji wan kesan re tu behsa tundkariya li te hatiye kirin bikî ku baweriya te bi wan tê. Dibe ev kes xizmên te bin an jî pisporek be. Vegotina vî tiştî bi xwe wê barê te sivik bike. Dibe ku tu hin tiştan bi wan kesan re parve bikî ku te ew hilbijartine. Tu dikarî jê/ji wan bixwazî tenê li te guhdar bikin, pêşniyanan li te bikin, rêhevaltiya te bikin ango ji bo te tiştekî bikin. Ji te baştir ti kes nizane bê wê baweriya te bi kê bê yan bi kê neyê.

Alîkariyê ji bo dermankirinê werbigire:
Tu birîndar bûbî an jî nebî, ew kontrola dermankirinê ya ku piştî tundkariyê wê bê kirin dê bandoreke erênî li te bike. Dibe ku birîneke te ferq nekiribe hebe, nexweşîyeke cinsî piştî tundkariyê li te peyda bibe, ducaniya ku tu naxwazî derkeve holê û hwd. Bi kontrola dermankirinê re dibe ev tişt werin tespîtkirin û di dema xwe de rê li ber wan bê girtin û tu bê dermankirin. Her weha dibe te hê biryar nedabe ku saziya tenduristiyê tundkariya li te hatiye kirin ji saziyên peywendîdar re bibêje, lê divê ew saziya tenduristiyê delîlan di wextê wê de kom bike û van tomar bike. Tiştê herî girîng tenduristiya te ye.

Tu bi tena serê
xwe nikarî
têkoşînê bi
pêvajoya piştî
tundkariyê re
bikî.



Li gel kontrola
laşî ya dêrûnî jî
gelekî giring e.



Giliyê kesê tundkarî li te kiriye bike:

Tundkariya cinsî ne sûcê te ye. Xetaya fail e û sûc ê wî ye. Ji mafê te yê herî bingehîn e ku dema êrişeye cinsî li te hate kirin tu giliyê failî bike. Piştî tundkariyê tu ne bi tenê yî û yê ku divê fedî bike û xwe veşêre ne tu yî. Li Tirkiyeyê saziyên ku piştgiriyê didin kesên ji ber tundkariyê filitîne û pisporê karêñ xwe birêkûpêk dikan hene. Pêvajoya yasayî her çawa bi encam bibe bila bibe, rêya lêgerîna li dadê bixwe, bandoreke neyêñî li mirovan dike. Ligel vî tiştî dibe ku hêzê bide kesên rastî tundkariyê hatine.

**Li Tirkiyeyê
rêxistinêñ civaka
sivîl, medyaya
civakî û raya
giştî ya xurt heye
ku piştgiriyê
didin kesên ji ber
tundkariyê filitîne.**



Şêwirmandiya palpiştî:

Ka em hemû xalêñ li jor deynin hêlekê, ji bo tu bikaribî bi encamêñ neyêñî yêñ tundkarî yan jî êrîşa cinsî re têkoşînê bikî û rê û rêbazêñ vê têkoşînê bibîñî, piştgirîya pisporan dibe bandoreke mezin bikin. Dibe ku di vê demê de hestêñ te zû bi zû biguherin, hin tişt tundkariyê bîñin bîra te, stres bi te re çêbibe, tu bikevî depresyonê.

**Gelekî girîng e ku piştî
bûyereke weke tundkariya
cinsî a gelekî trawmatîk,
di dema dermankirinê
de pisporêñ di mijara
tundkariya cinsî de xwedî
tecrûbe ne û baweriya te
bi wan bê, te ne darizinîn
piştgirîya psikolojik
bidin te û terapiyê bikin.**



Lêkolînan li ser alternatifên cida bike:

Pêvajoya dermandikirina piştî tundkariyê ne weke xeteke rast e. Bi fitlonek e. Dibe ku hin caran dirêj be hin caran jî zû biqede. Helbet tu ne mecbûrî ku tu her gavbihêz bî. Û divê tu careke din bibîra xwe de bînî, tu ne bitene yî.

Dibe ku te hay jê nebe lê gelek alternatifên cida yên ji bo piştgriyê tên peydakirin.

Lêkolîna li ser van, dibe bihêle ku tu tiştên fêda wan li te heye derxî holê û tu bihêz bibî. Em bibêjin tu naxwazî serlêdaneke yasayî bike, tu dikarî lêkolînê li ser alternatifên din ên serlêdanê bikî ku nav û nasnavên te aşkere nekin (Nexşeya Harrasmapê, xebatênu ku saziyên civaka sivil weke rapor amade dikin û hwd). Li gel van tiştan tu dikarî bi xwe alîkariya xwe bikî, egzersizan bikî, beşdarî bernameyên piştevaniya mirovan dikin bibî, peywendiyan bi kesên din re deynî, şêweyên cida yên piştevaniyê û alîkariyê bibînî, karekî peyda bikî, beşdarî bernameyên cida yên spor û çandê bibî, piştevaniyê ji çîroka keseke navdar bistînî. Di dema giîkirinê de heke hûn nexwazin kes bizanibe bê ka hûn kî ne, hûn dikarin bi rêya CIMERê yan jî Alo 183ê bêyi nasnameyâ xwe aşkere bikin serlêdana fermî bikin. Di vê rewşê de zanyariyên nasnameyâ we li ti cihêñ fermî xuya nakin.

**Heke hûn
naxwazin
serlêdaneke
yasayî
bikin, hûn
dikarin wan
li lêkolînêñ
rê û rîbazêñ
nasnameyâ we
aşkere nekin,
bigerin**



* <https://sendeanlat.harassmap.org/tr>



Ew pêvajoya tacîz û tecawizê yan jî
istismara cinsî ya di zarokatiyê de hate sere
min, ji bo min veguhestermankirina birîna
min û bi saya wê piştî tundkariyê min jiyana
xwe berdewam kir. Tundkarî nikare navekî li
min bike. Ez û hemû serpêhatiyên xwe, nabe
ji hev cida werin nirxandin.

“Min biryar da ku ez giliyê fail bikim...”

Ne hêsan e ku mirovek derbarê tundkariya cinsî de biaxive, bi taybet jî derbarê tundkariya cinsî ya lê hatibe kirin, her weha ji hinekan re behsa wê bike. Her bi çi rengî dibe bila bibe dema te biryar da û te xwest ‘edalet’ pêk were, bi vê re tê neçar bimîne ku gelek caran behsa bûyera xwe bike. Ev dibe ji bo te zehmetiyan derxe. Li gel vê rewşê, dibe ku bi vê biryarê re pêvajoya tundkariyê bi awayekî erêni biencam bibe, tu bihêz bibî û tu bizanibî ku kontrola jiyana te di destê te de ye. Heke zanyariyên te derbarê sistêma serlêdanê ya heyî û pêvajoyê wê de hebin, dibe ku metirsiyê te kêmter bibin û tu bêhtir amade bibî.

Gavê destpêkê yên girîng;

- Piştî ku te biryar da û te xwest tu saziyên peywendîdar derbarê tundkariyê de agahdar bikî, destpêkê tu dikarî biçî nêzîktirîn **qereqola polisan (an jî cendermeyan)**, nêzîktirîn **dozgeriyê**, an jî nêzîktirîn **nexweşxaneyê**. (Ew cihênu ku tu dikarî serî lê bidî, di nexşeya dezgehan a li ser malpera **csdestek.org-ê** de û çavkaniyêna cida de peyda dibin)
- Heke tu nikaribî biçe wan deran, tu dikarî bi rêya telefonê li **155 polis** (an jî **156 jandarmayan**) bigerî û behsa rewşa xwe bikî. Tu dikarî alîkariyê ji wan bixwaze.
- Heke li wê deverê tu nikaribî biaxive, wê gavê tu dikarî Sepana Piştgiriya Ji Bo Jinan (KADES) a asayışe daxe telefona xwe ya mobile-ê û bi kar bînî. Ew sepaneke telefonên mobile-ê yên smart in û di rewşen tundkariyê an jî xetereya tundkariyê de ji bo hêzên asayışe bilez û bez midaxeleyê bikin hatiye çêkirin. Di nava sepanê de bişkokek heye, heke di rewşen awarte de hûn pê li vê bişkokê bikin wê cihê we li navenda polisan a herî nêzîk were xuyakirin. Mixabin sepana bi navê KADESê tene bi zimanê Tirkî hatiye amadekirin û tenê kesên nimareya nasnameyê wan a biyaniyan heye dikarin wê bikar bînîn. Bikaranîna KADESê gelekî hêsan e, heke hûn bi Tirkî nizanibin jî nas û dostêne we yên bi Tirkî dizanin, dikarin fêr bibin bê ka çawa tê bikaranîn. Ev tişt di rewşen awarte de wê fêdê li we bike.

- Di çûna qereqol, nexweşxane yan jî dozgeriyê de kesekî/e tu pê bawer dibî dikare li gel te were. Ev ji bo te wê bibe piştevan. Heke ku hûn bi Tirkî nizanibin, kesekî/e bi Tirkî bizanibe li bal we be wê baş be. Lê divê destura fermî ya niştecihbûnê ya wî/ê kesê hebe, ji bo mana li Tirkiyeyê. Heke ew kes bi awayekî yasayî nikaribe li Tirkiyeyê bimîne, dema bi we re were ji bo serlêdanê, dibe ew bê dersinorkirin. Heke mafê we yê niştecihbûnê bi awayekî yasayî li Tirkiyeyê nebe û hûn serî li qereqolekê bidin dibe tehqîqat ango kirariyên îdarî ji bo we werin kiri. Ji ber vê rewşê, li şuna qereqolê em pêşniyar dikin ku hûn serî li dozgeriyan bidin an jî li wir giliyê xwe bikin.
- Li saziya ku te serî lê da, tu dikarî daxwaza parêzerekê/î bike. Dema ku te ev daxwaz kir (qereqol, dozgerî yan jî dadgeh) wê parêzerekî/ê ji bo te wezîfedar bike. Ne diyar e bê ka parêzerê ku ji bo we wê bê tayînkirin bi zimanê we dizane an ne, perwerdeyeke taybet li ser penaberan/biyaniyan standiye an ne. Lê hûn dikarin bi rêya parêzera/ê xwe, an jî bi xwe rasterast bibêjin ku hûn dixwazin ifadeya xwe bi alîkariya wergerekî/ê bidin. Qereqol û dozgerî ne tê de, li buroyên edîlî yên baroyan ji bo karen we yên hiqûqî him di warê mafên jinan de him jî di warê mafên penaberan de parêzerên perwerdeya taybet dîtine hene (Ji bo karêñ hevberdan û yên weke wê).

- Heke ku tecawiz li te hatibe kirin, destpêkê serî li nexweşxaneyê bide. Ji ber ku bi vê re tê bikaribe yekser alîkariya dermankirinê werbigire û dibe ku delîl zûbizû werin berhevkirin. Li nexweşxaneyan bi taybet polîsên nexweşxaneyan hene. Bi rêya doktorê/a xwe hûn dikarin gîlî bikin an jî rasterast hûn bi xwe daxwaz bikin û şîkayeta xwe ji polîsên nexweşxaneyê re bibêjin. Hûn dikarin daxwaz bikin ku zabitname bê nivîsandin û saziyên peywendîdar yên edlî werin agahdarkirin. Herweha heke hûn ji bo xwe guncav bibînin û şert û mercên nexweşxaneyê guncav bin, hûn dikarin bixwazin ku doktoreke jin kontrola we bike.
- Dema êrîş pêk hat **di kurttirîn demê de (72 saetên destpêkê)** heke ji destê te were xwe neşo, cil û bergên ku di dema bûyerê de li ser te bûn neguherîne û biçe saziya tê serî lê bide. Tu dikarî cilûbergên din jî bi xwe re bibe. Heke te cil û bergên xwe ji xwe kiribe, wan bixe kîsekî nenaylon ê paqij (ritûbeta kîsê naylonî dibe ku bihêle delîl winda bibin), devê wî baş bigire û tu dikarî wî bi xwe re bibe. Girîng e ku tu li van tiştên em behsa wan dikan baldar bî. Lê heke ji ber rewşa tu têdeyî, te yek ji van jî pêk neanîbe, netirse, hin tiştên din hene ku sûcên cinsî bi wan tênen delîlkirin. Pispor lêkoînan li ser wan detayan dikan ku nayên hişê te. Ev sûcê ku hatiye kirin tê ispatkirin.

- Tu dikarî wan mesaj, fotograf û tiştên din ên nivîskî û dîtbarî yên dibe bibin delîlên êrîşê biparêze û heke ji destê te were tu bi xwe jî fotografên ku dibe bibin delîl bigire.
- Ew kesên ku dixwazin alîkariya te bikin û xizmetê bidin te dibe ku hin liv û tevgerêwan şas bin û bi wan tiştan te bidarizînin. Mafê wan kesan nîne ku di dema kar de helwesteke neyêni bi gotinan an jî bi liv û tevgeran nîşanî te bidin.

Pêvajoya Qereqolê;

Gavêñ divê bêñ avêtin:

- Tu dikarî biçî nêzîktirîn qereqol an jî Midûriyeta Emniyetê ya Navçeyê. Heke derfetên te hebe, serî li Yekîneya Têkoşîna Li Dijî Tundkariya Li Jinan û Tundkariya Li Nava Malê ya Midûriyeta Emniyetê ya Navçeyê bide.
- Ji polîsan re bibêje ku tundkariya cinsî li te hatiye kirin. Beriya ku tu ıfadeya xwe bidî tu dikarî daxwaza parêzerekî/ê bike. Ji bo parêzerek were wezîfedarkirin polîs çi hewce be wê bike. Heke li qereqol an jî li dozgeriyê hûn daxwaza parêzerî/ê bikin, ji serwîsên CMKyan yên baroyan bêyî hilbijartinekê, parêzerek wê ji were bê şandin. Wê ne diyar be bê ka parêzerê ji were hatiye şandin bi zimanê we dizane yan na, an jî bê derbarê penaber/biyaneyan de xwedî perwerdeyeke taybet e yan na. Di rewşeke wiha de hûn bi xwe dikarin bixwazin ku ıfadeya we bi alîkariya wergerekî/ê were wergirtin an jî hûn dikarin bi rêya parêzerê/a xwe vî tiştî daxwaz bikin.
- Polîs zanyirayan dide dozgerî û dozger fermanê dide polîsan. (Heke ku tu bixwazî tu dikarî rasterast biçe bal dozgeriyê.) Rast e, divê polis her gavê ji bo kesên biyanî wergeran peyda bikin lê gelek caran werger nayêñ peydakirin. Heke hûn bi Tirkî nizanibin, li şûna hûn rasterast biçin qereqolê, biçin edliyeyê û serî li dozgeriyê bidin, ev wê bêhtir ji we re bibe alîkar ku hûn

behra rewşa xwe bikin. Dozgerî di nava edliyeyan de ne û li edliyeyan wergerên peyman bi wan re hatine çêkirin hene. Heke hûn serî li dozgeriyê bidin, dibe bi hêsantir ji we re wergerek were peydakirin.

- Piştî ku te ıfadeya xwe da, bêyî lez û bezê, ıfadeya xwe bixwîne, heke tiştekî kêm an jî xelet tê de nebin tu dikarî ïmze bike. Heke we ıfadeya xwe bi alîkariya wergereki/ê dabe gelekî girîng e ku hûn metna ıfadeya xwe bixwînin û heke li gor dile we be hûn ïmzeya xwe li binî binivîsin. Heke kêm an jî şas hatibe wergerandin, beriya ku hûn ïmze bikin, mafê we heye hûn bixwazin ew werin sererastkirin. Heke hûn ïmzeyê bidin bin metnê, paşê wê zehmet be hûn wan tiştan qebûl nekin an jî red bikin.
- Polîs wê te bişînin nexweşxaneyê. Li vir wê kontrola te ya tenduristiyê were kirin. Ji bo delîl bêñ komkirin û tundkarî were tomarkirin wê hin kar û bar bêñ kirin.
- Li qereqolê wê dosyeya te were amadekirin. Raporên te, ıfadeyên te wê bixin nava vê dosyayê û wê dosyayê radestî dozgeriyê bikin. Polîs êdî divê nasnameya gumanbarî derxin holê û ji bo lêpirsîn bê kirin, karûbarêñ hewce bikin. Heke parêzerê/a we hebe wê ew li ser navê we û bi we re vê pêvajoyê bişopîne.

Mafêñ te:

- Heke tu di rewşeke xeter de bí, tu dikarî li qereqolê bixwaze biryara parastinê yan jî biryara tedbirwergirtinê bê dayîn. Polîs bi berpirsiyar in ku te biparêzin û hemû karûberên fermî yên hewce pêk bînin.
- Dozgerî biryarê dide yan jî pêwîst bike polîs di rewşen aloy û lez û bez de dikarin hemû biryaran bi xwe bidin ku di van rewşan de heke biryar dereng bê dayîn wê xetere derkeve holê. Divê dozger van biryaran bidin û polîs li gorî wan tevbigerin.
- Dema te serî li polîsan da, nasnameya te tenê bi te re be têrê dike. Heke nasnameya te nebe jî ji bo karûbarêñ fermî, polîs neçar in nasnameya te diyar bikin. Heke ku hûn biyaniyekî li Tirkiyeyê bin, bi nasnameya parastinê ya demkî, belgeya parastina duyem /penaberiyê/penaberiya bişert û merc, belgeya destûrê ya niştecihbûnê an jî tenê bi pasaporta xwe hûn dikarin serî lê bidin. Heke destûra niştecihbûna we li Tirkiyeyê nebe û hûn serî li qereqolê bidin, ji ber nebûna destûra we, dibe polîs derheqê we de kirarêñ edlî û îdarî bikin. Ji ber wê, heke destûra we nebe, li şûna qereqolê, em pêşniyar dikan ku hûn biçin dozgeriyê gilî bikin.

- Di rewşên lezgîn de û di dema aloziyan de polîs neçar in te bibin stargeha jinan an jî yekîneyê qebûlkirina stargehan. Heke hûn li Tirkîyeyê biyanî bin, ji bo we li ŞONIMê qebûl bikin, divê ji bo niştecihiya we destûra we ya fermî hebe. Ji bo li ŞONIMê an jî li stargeheke din a jinan hûn bikaribin bimînin, em pêşniyar dikin ku alîkariyê ji parêzer an jî ji rêxistineke civaka sivîl bistînin.
- Dema berê te bi nexweşxaneyê, dozgerî yan jî asayışê ve bikin, mafê te heye tu piştgiriyê ji polîsan bixwazî. Heke ku tu di nava ewlehiyê de bî, li gorî yaseyan polîs nexwazin dikarin te nebin. Tenê di şert û mercên guncan de dikarin te bibin.
- Heke kesa serî lê daye bi tirkî nizanibe, polîs divê wergêrekî/ê peyda bike. Heke nikaribe peyda bike, divê ji bo ıfadeyê wî/wê bişîne dozgeriyê.
- Heke tu nikaribî biçe qereqolê polîs neçar in ku werin wî cihê ku tu lê yi.
- Heke tu kopyayek ji ıfadeya xwe yan jî dokumanên din ên serlêdanê bixwazî, polîs neçar in wan bidin te.
- Digel ku tundkarî weke sûcekî ji rêzê yan jî weke êrîşa cinsî ya bibandor tê penasekirin jî di nava qanûna hejmar 6284ê de ye û heke tu DIXWAZÎ BIRYARA
PARASTINÊ BÊ DAYÎN bêyî ti dokuman (dokumana

xizaniyê û yên weke wê) ji te bêñ xwestin, baro wê parêzerekî ji te re bişîne û ji bo vê tu ti pereyan nadî. Heke ku hûn bixwazin birtyara parastinê ji bo we were dayîn, lê hûn nizanin hûnê çi bikin, em pêşniyar dîkin ku hûn serî li buroyêñ alîkariya edîl ya baroyan bidin û bixwazin ku parêzerekî/e di warê mafêñ jinan û mafêñ penaberan de perwerdeya taybet dîtiye alîkariyê bide we.

- Tu ne neçarî ku hemû pêvajoyê bi wî parêzerê ji bo te hatiye tayînkirin re birêve bibe. Heke ku parêzerê/a te ne li gorî dile te be, tu dikarî bi saziyên civaka sivil yên di vî warî de kar dîkin bişêwire û mafê te heye tu parêzerê xwe biguherî. Nabe parêzer baweriyê bi te neyne û ew te bidarizîne. Ev ne li gorî etîka pîseyî ye.
- Polîs berpirsiyar e ku lêkolîneke berfireh û kûr bikin. Nabe ku ji te bixwazin tu karê wan bikî. An jî nabe metirsîyê li ser te çêbikin. Berpirsiyar in ku dokumenan û zanyariyan bi awayekî rast û li gorî rêzê berhev bikin û wan tomar bikin. Her weha bêyî ku dereng bimînin divê wan ji bo saziyên peywendîdar ragihînin. Sûc e ku ji te bixwazin tu delîlan bi xwe kom bike.
- Di dema lêpirsînê de mafê te ye û tu dikarî bixwaze ku dema li cihê bûyerê lêkolîn tê kirin (delîl tê berhevkirin) parêzerê te li ba te be.
- Nabe ku polîs ji bo tu dest ji gilîkirina xwe berde te qanîh bikin. Nikarin guh nedîn te. Nabe ku te ji ber gilîkirinê poşman bikin. Û te li wir bidin sekinandin. Nabe ku karê xwe serobero bikin; bi ti awayî nikarin

pêşniyar bikin ku tu û kesê te giliyê wî kiriye li hev bêñ, hûn rû bi rû werin. Ev hemû jî sûc in. Polîs berpirsiyar in ku gilînameya te werbigirin. Nabe polîs ji bo gilîkirinê berê we bide dozgeriyê. Heke we giliyê xwe li bal polîsan kiribe yan jî we serî li polîsan dabe, divê derbarê daxwaza we de pêwistiyêñ yasayî çi ne bikin.

- Di pêvajoya dadgehkirinê de tu dikarî bixwaze ku tu û berguman rûbirûyî hev neyên. Ev mafê te ye. Mafê te ye ku tu bixwazî ji bilî te ti kes besdarî danişîna îfadedayina te nebin.

- Qanûna hejmar 6284ê; kesên rastî tundkariyê hatibin an jî xetereya tundkariyê li ser wan hebe li gorî xalêñ vê qanûnê têñ parastin. Her weha Ji bo rê li ber tundkariyê bê girtin, tedbîrêñ ku divê bêñ standin diyar dike. Tu dikarî bixwaze ku te li stargehê bi cih bikin, biryara parastina demkî bidin, nehêlin fail nêzîkî te bibe/te aciz bike û gelek mafêñ te yên din jî hene. Dibe ku hin dadger an jî parêzer vê qanûnê nizanibin û tu jî rastî wan bê. Di rewşen wiha de gelekî girîng e ku tu mafêñ xwe bizanibî.

Pêvajoya nexweşxaneyê;

Tiştên ku divê tu gav bi gav bikî:

- Di nava 72 saetên piştî êrîşê de heke tu bikaribî bî cil û bergên ku di dema êrîşê de li ser te bûn bixe kîsekî nenaylon û devê kîsî girê bide. Bila ew kîs li ba te be. Heke ji destê te bê, ew delîlên li ser laşê xwe biparêze (yani xwe neşo) û bila bala te li ser hin detayên din be.
- Tu dikarî biçe nêzîktirîn nexweşxaneyê ku beşa wê ya lezgîn hebe. Heke ji destê te bê biçe nexweşxaneyên dewletê, heta tu bikaribî biçe nexweşxaneyên zanîngehan yên pisporiya wan ji hêla tundkariya cinsî ve hene. (Tu dikarî di wê nexşeya yekîneyan a li ser malpera csdestek.org-ê de lîsteya van nexweşxaneyan bibînî.) Dema hûn biçin nexweşxaneyê wê qeyda we di lîsteya bûyerên dadî de were çêkirin. Piştî vî karî, ji bo midaxeleya lezgîn û raporgirtinê wê ti pere ji mexdûrî neyê standin. Kesên ti misogeriya wan a tenduristiyê nîne, bêyî ku bifikirin bê ka wê çi bibe, dikarin serî li nexweşxaneyê bidin.
- Tu dikarî giliyê êrîşkarî li bal polîsên nexweşxaneyê bikî. Heke te ji bo gîlîkirinê hîna biryar nedabe dîsa jî tu dikarî ji doktorekî re behsa rewşa xwe bike ûbihêle te kontrol bike. Her weha tu dikarî bixwazî ku vê rewşa te tomar bike. Divê neyê jibîrkirin ku li gor qanûnê doktor neçar in saziyên peywendîdar ji bûyerên darazî agahdar bikin.

- Li gorî rewşê, wê berê doktorê/a welidandinê û yê/a jinan û doktorê/a rewşên lezgîn te kontrol bikin.
 - Dema tu çû nexweşxaneyê ji kesê navê te tomar dike re behsa êrîşa cinsî bike ku tu rastî wê hatiye. Wê gavê dê berê te bide cihê divê tu biçe wir.
 - Li gorî rewşê, wê berê doktorê/a welidandinê û yê/a jinan û doktorê/a rewşên lezgîn te kontrol bikin.
 - Kontrola psîkatrîk jî ji bo tenduristiya te gelekî girîng e. Li gel nîşaneyên laşî, nîşaneyên giyanî jî di sûcên tundkariya cinsî de dibin delîlên girîng. Mafê te heye ku tu bixwazî ku hemû kontrol birêkûpêk werin kirin.
 - Dema tu çû nexweşxaneyê û te xwest giliyê êrîşkaran bike, saziya tenduristiyê wê di serî de te ji bo gavên destpêkê agahdar bike û gavên li gorî wê bivêje. Tê ïfadeya xwe ya pêşiyê bide polîsên nexweşxaneyê. Heke ku li nexweşxaneyê dermankirina te berdewam bike polîsên qereqolê wê werin û tê ïfadeyê bide wan. Heke tu ne neçar bî ji bo demeke dirêj li nexweşxaneyê bimîne wê gavê dikarin ji te bixwazin tu biçî qereqolê û tu ïfadeyê li wir bidî.
 - Piştî hemû kontrolên te qedîyan tu dikarî ji nexweşxaneyê biçe. Xebatkarên nexweşxaneyê berpirsiyar in ku ji bo dermankirina lezgîn midaxele bikin, kontrola te ya tenduristiyê bikin û nîşaneyên derbarê tundkariyê de weke rapor amade bikin.

Mafêñ te:

- Li wê odeya ku tê lê bê kontrolkirin, ji bilî doktorî/ê, ti kesên din (kedkarê tenduristiyê yê ku pêdivî pê nîne, polîs, heke tu nexwazî nas û dostêñ te) nikarin bimînin.
- Xebatkarê/a tendurisitiyê bêyî destûra te nikare dest bide laşê te. Neçar e ku pirsêñ te bibersivîne.
- Xebatkarê/a tenduristiyê ji bo tenduristiya te li wir e. Divê nelezîne, netirse û piştgiriyyê bide te.
- Ji ber ku xebatkarê/a tenduristiyê ne kesên ïfadewergirtinê ne, mafê te heye tu pirsa wî/ê ne bersivîne.
- Heke ku tu bixwazî agahiyê nede dezgehêñ yasayî, bêyî bi awayekî fermî bê tomarkirin, tu dikarî tenê ji doktorî/ê re bibêje tu rastî êrîşê hatiyî û bi vî awayî kontrola te ya tenduristiyê bê kirin. Bêyî rapora edlî were nivîsandin tu dikarî daxwaza zanyariya nîşaneyêñ êrîşê bike û tu dikarî alîkariya tenduristiyê bidest bixî.
- Tu dikarî bixwaze ku doktoreke jin te kontrol bike. Nexweşxane li gorî derfetan neçar e ku vê daxwaza te bicih bîne.
- Bêyî biryara dozgeriyê li ti nexweşxaneyan nabe kontrola tiba edlî were kirin. Tenê bi destûra te dikarin kontrola jînekolojîk bikin.



ŞİFAYA PIŞTİ TUNDKARIYA CINSİ
SEBR, HEWLDAN, WÊREKÎ, ALÎKARIYA XWE-BIXWE

Heke tu gilî nekî, ev nayê wê wateyê ku te sûcek kiriye yan jî ew tundkariya li te hatiye kirin ne rast e. Pişti êrîşa cinsî ji bo edalet pêk were, cezakirina failî bi tena sere xwe ne bes e. Edalet ew tişt e ku tu bikarîbî alîkariyê bi dest bixî, pişti tundkariyê tu were dermankirin ûbihêz bibî. Baweriya me bi wan kesen ji tundkariya cinsî filitîne tê, ew ne bi tenê ne...

LI TIRKIYEYÊ SAZIYÊN DEWLETÊ YÊN KU DI DEMA TUNDKARIYA CINSÎ Û ISTISMARÊ DE ALÎKARIYÊ DIDIN MIROVAN EV IN

ALO 183 – Xeta Piştgiriyê ya Wezareta Xizmetguzariya Civakî, Malbatan û Xebatê ya Stenbolê

Heft rojan û 24 saetan bê navber û bê pere xizmetê didin. Xizmetê bi kurdî û bi erebî jî didin. Kesên ji hêla axavtin û dîtinê ve kêmendam in di nava hefteyê de saet ji 08.00ê heta 24.00ê, roja şemiyê jî saet ji 08.00ê heta saet 17.00ê bi rêya telefonên teknolojiya 3Gyê bikar tînin, dikarin alîkariyê werbigirin.

ALO 150 – Navenda Ragihandinê ya Serokomariyê (CİMER) <https://www.cimer.gov.tr/>

Heft rojan û 24 saetan bê navber û bê pere xizmetê didin. Hûn dikarin bi rêya telefonê li nimareya 150yî bixin, li ser malpera CİMERê bi nivîskî an jî şîfreya xwe ya e-devletê bikar bînin û tundkariyê gilî bikin. Herî dereng di nava 30 rojan de wê bersivê bidin we.

**Midûriyeta Xizmetguzariya Civakî, Malbatan û Xebatê ya
Stenbolê – +90 212 511 42 75**

**Yekîneyên Xizmezguzariya Ji Bo Jinan ên di bin banê
Midûriyeta Xizmetguzariya Civakî de kar dikan. Li her bajarî
hene û ji hêla Wezaretê ve hatine avakirin. Giliyên ku ji bo
nimareya 183yê jî tên kirin, ji bo lêkolînê dişinin van navandan.**

**Navenda Çavdêrî û Şopandina Tundkariyê ya Kozayê
(ŞÖNİM) - +90 212 465 21 96**

Midûreyitên Beşa Zarokan ên Midûriyetên Emniyetê

Dozgeriyêñ Komarî

ALO 155 (Polis)

ALO 156 (Jandarma)

**Nêzîktirîn navenda polîsan, nêzîktirîn yekîneya
xizmetguzariya civakî**

Navenda Alîkariya Edlî ya Baroya Stenbolê - 0212 251 63 25

Navenda Mafêñ Zarokan a Baroya Stenbolê

Serwîsa Bicîkirina CMKyê ya Baroya Stenbolê - 444 52 71

Nexşeya Parastina Zarokan

<http://www.cocukkorumaharitasi.info/>

NİŞE



csdestek.org



<https://cinselsiddetlemucadele.org>

cinselsiddetlemucadele cs_mucadele cinselsiddetlemucadele dernegi

+90 542 585 3990 | info@cinselsiddetlemucadele.org